Beratungszentrum für Migranten und Migrantinnen

Arbeitsmarktpolitische Beratungs- und Betreuungseinrichtun



# Wergirtina/Qedandina hemwelatîya/cinsî Awûstryayê (Nemsa)[1]

Hemwelatîbûna Awûstiryayê dikare bi awayên cuda cuda were wergirtin. Bi gelemperî, ew bi rêya eslê xwe an jî bi rêya fermî/welatîbûnê (Verleihung) tê wergirtin.

## 1. Bi eslê xwe/Bi rêya nesebê (xwîn)

Hemwelatîbya Awûstrayê **bi dayikbûnê** tê wergirtin:

- zarokên ku di zewacê de hatine dinê, heke yek ji dêûbavan welatiyê Awûstryayê hebe
- Zarokên ji derveyî zewacê hatine dinê, heke dayik hemwelatiya Avûsturyayê be.
- Zarokên ji derveyî zewacê hatine dinê, eger bav welatiyê Awûstiryayê be û di nav heşt hefteyan de piştî ji dayikbûna zarok bavtiyê qebûl kiribe an jî eger bavîtî di heman demê de bi qanûnî/bi biryara dadgehê hatibe destnîşankirin/were pejirandin. Piştî vê demê jî, hemwelatîbûn dikare bi rêya rewakirinê piştî zewacê dê û bavan an jî bi rêya dayîna fermî (li rûpel 2 binêre).

## 2. Dayîna fermî (Verleihung)

### 2.1. şertên giştî ji bo dayîna hemwelatîyê:

- **Helwesta/bawerdayina erênî** li hember Komara Awûstryayê û bê gef li ser aramiya û nîzama giştî, rêz û ewlehiyê giştî; bê têkiliyeke nêzîk bi komên terorîstî an redîkal/ekstremîstî;
- **Qeyda sûc a paqij/Pakî** (ne tunebûna mehkûmkirinên dadgehê, ne tunebûna dozên sûc ên/ceza yên vekirî – li hundir û li derve welat, û ne tunebûna sûcên/cezayên îdarî yên giran/binpêkirinên girîn ên îdarî);
- **Ne tunebûna prosedûran an biryarên ku ji bo qedandina mayîna li welatê** ne (mîna qedexeya mayînê, biryara vegerandinê, derxistinê û hwd.), û ne tunebûna astengên din (derxistina di 18 mehên dawî de, qedexeya têketinê û hwd.)
- **Derketina** ji hemwelatiya/cinsîya berê, heke ev ne mimkîn be an jî ne maqûl be;
- **Jiyana aborî ya bi têra xwe parastî**, di nav 36 mehên navîn ji 6 salên dawî de, û bi taybetî di 6 mehên dawî beriya daxwaznameyê. Di vê demê de divê dahat bi kêmanî bi rêjeya standard a ASVG (Qanûna Sîgortaya Civakî ya Giştî) re bigihîje û dibê alîkariya civakî (Mindestsicherung) nehatibe wergirtin. Têbînî: Xercên daîmî (kirê, qezencên kredî, girtinên pereyê, alîkariya zarokan û hwd.) dikarin dahat kêm bikin. (Ji bo kesên bi seqetî an nexweşiyên giran ên daîmî, dikare rêjeyên dawîn bi rapora bijîşkê were kêmkirin);
- **Demjimêra mayînê ya diyarkirî** (Bi gelemperî divê dema mayînê bênavber û qanûnî be. Mayîna li derveyî welêt tenê heta %20ê tevahiya dema mayînê destûre.)

---

**Têbînî/Nîşankirin:**

(1) Ji ber ku ev belge kurt e, tenê rêyên herî gelemperî û hin komên kesan hatine ravekirin.

(2) Delîla zanînên zimanê Almanî divê bi belgeyên enstîtûsyonên zimanî yên pejirandî were nîşandan. Zanînên li ser Awûstryayê û eyalet bi serkeftina îmtîhana li aliyê daireya hemwelatiyê ve tê nîşandan. Belgeyên fêrkê hûn dikarin li vir bibînin: www.staatsbuergerschaft.gv.at

Hin kes ne pêwîst e van delîlan pêşkêş bikin (mîna zarokên bin 14 salî, hin kesên taybet, kesên bi rewşa tenduristiyê ya xirab û hwd.), an jî ev şert wekî pêkhatî tê hesibandin (mîna xwendina niha ya dibistana seretayî an dibistana navîn û nirxandina baş ya dersa "Deutsch").

**2.2. Hemwelatiya Awûstryayê dikare were dayîn (li gorî erêzîya otorîteyê/li gorî biryara rayedaran), heke şertên giştî û ev şert hebin:**

**Piştî 10 salan mayîna qanûnî û bê qutbûn** li Awûstryayê (ji wan bi kêmanî 5 sal bi rewşa niştecîbûnê)

**2.3. Hemwelatiya Awûstryayê divê were dayîn (bi mafê qanûnî), heke şertên giştî û ev şert hebin:**

**Bê şertê demê ya mayînê:**

- Zarokên biçûk û ne zewacî, heke bi kêmanî yek ji dê û bav hemwelatiyê Awûstryayê be û dayîna hevbeş bi dê/bavê din ne mimkîn be;
- Zarokên biçûk ên hatine qebûlkirin (adoptîf) ji dê û bavên Awûstryayê an zarokên biçûk ên li derveyî zewacê yên bavên Awûstryayê ku hîn hemwelatiyê Awûstryayê nîne. (Gelek şert ne pêwîst e ku li wan were sepandin.)

**Piştî 6 salan rûniştina qanûnî û bênavber/ Piştî 6 salan mayîna qanûnî û bê qutbûn:**

- Hevalên zewacê / hevalên şertî yên hemwelatiyên Awûstryayê, ku bi hev re dijîn û zewac/hevparî bi kêmanî 5 salan hebe
- Hemwelatiyên dewletên EWR;
- Kesên ku li Awûstryayê hatine dinê;
- Heke zanînên zimanê Almanî li asta B2 hebin;

Delîla entegrasyona kesane ya dirêjdemî, mîna: bi kêmanî sê sal xebata bi dilxwazî li rêxistinên xêrxwaz, an bi kêmanî sê sal xebata pîşeyî di qada perwerdehî, civakî an tenduristiyê de, an bi kêmanî sê sal karîgera fonksiyonê li komekê interesî.

**Piştî 10 salan mayîna qanûnî û bê qutbûn:**

- Kesên bi mafê penaberî (Asylberechtigte)

**Piştî 15 salan mayîna qanûnî û bê qutbûn:**

- Heke entegrasyona kesane û pîşeyî ya dirêjdemî hebin

**Piştî 30 salan xaniyê sereke û bê qutbûn li Awûstryayê**

**2.4. Dirêjkirina dayîna hemwelatiyê bo endamên malbatê**

Bi daxwaznameyekê hevbeş, zarokên biçûk (bê demê li bendê) û hevalên zewacê / hevalên şertî (piştî 6 salan mayîn û 5 salan zewacê) jî dikarin hemwelatiyê bistînin.
Divê ev kes niştecî bin, bi mafê penaberî bin an jî xwedî karta legîmasyonê bin

**2.5. Prosedûra daxwaznameyê**

Daireya berpirsiyar ji bo dayîna hemwelatiyê, Beşa Hemwelatiyê ya Hikumeta Eyaletê ya cihê ku hûn lê dijîn e. Ji ber ku prosedûr pir aloz û dirêj e, divê hûn beriya daxwaznameyê bi otorîteya têkildar re têkilî daynin û bipirsin ka şertên pêwîst pêk tîne an na û kîjan belge pêwîst in. Li Viyanê, pêdivî ye ku hûn pêşî beşdarî çalakiya agahdarkirina seretayî bibin; piştî wê hûn dikarin daxwaznameyê pêşkêş bikin.Girêdana şertkirina demê: https://ticket.wien.gv.at/M35/vlcua/

**Hişyarî:** Ji ber ku li vir tenê şertên herî girîng hatine vegotin, em pêşniyar dikin ku hûn agahdariyên hûrgulî ji otorîteyên berpirsiyar an navendên şîretkariyê bistînin. Her çend ku belge bi baldarî hatî amadekirin, dibe ku çewtî çêbibin; ji ber vê yekê tu garantî ji bo agahdariyên vê belgeyê nayê dayîn


| Beratung für Männer und Frauen<br>1010 Wien, Hoher Markt 8/4/2 Tel: 01 712 56 04<br>http://www.migrant.at E-Mail: migrant@migrant.at | Beratung für Frauen<br>1010 Wien, Marc Aurel Straße 2a/2/10 Tel: 01 982 33 08<br>http://www.migrant.at E-Mail: migrantin@migrant.at |
|---|---|



Diese Publikation wird aus Mitteln des Arbeitsmarktservice Wien und der Magistratsabteilung 17 gefördert

AMS Arbeitsmarktservice Wien — Stadt Wien Integration und Diversität